



Bi vaftîzê mirov dibin endamê cemeata Mesîhiyan. Ji bona rîtuela vaftîz kirinê legenekî pêwîste û ev legen gelek caran di nava kevîrekî neqîşkirî da cîh digre. Di dema îroyîn de zarokên piçûk di Dêran da tîn vaftîz kirinê ku, divê were zanîn ew jî êdî endamê cemeata Mesîhî ne.

Di rîtuela vaftîz bûnê da tiştê herî pîroz av e. An serê zarokan dikin binê avê - an jî fena ku Evangelîyan çêdikin av ser serî re tê rijandin, ava ku diherike, mehna xwe wehaye: ' Tu êdî bûyî endamê dînê Mesîhî, bi vê avê gunehê te tîn şuştinê. Tu tevî Îsa Mesîh hişyar bûyî û ketî nava jîyanekî nû.

Di dema rîtuêlê da gotinên weha tîn axaftinê: 'Ez te bi navê Xwedê, lawê wî û ruhên mûqaddes vaftîz dikim'.

Dema kevn da gava kesekî bixwasta bibûya Mesîhî, pêwîst bû ev kesana di derheqa dînê da bibana xwediyê zanînê. Him di derheqa nivîsên kitaba kitêba pîrozê da û him jî di derheqa dînê Mesîhî da. Lewra ji bona fêr kirina vê karê du endamên cemeatê ji wî, wê kesî ra dibûn alîkar. Ji wan kesên alîkar re digotin 'Patten', kirîv. Wan him di derheqa zanîna dînê da û him jî di tengasiyên jîyana rojane da ji wan kesan re dibûn alîkar.

Kevira vaftîzê



Nivîsên kitêba pîrozê di nava Dêrê de ji minberekî yê ji bona cemeatê tîn belav kirinê. Ev der ra dibêjin minber. Keşa, jin an jî mêr di nava Dêrê da ji cîhekî bilind va weaz didin ku, her kesek li wir kom bûye bikaribin wan bi rehetî bibinin.

Hîn caran serê minberan de fena çardaxekî bi qûmaşa şalê ve tê çêkirin. Ji ber ku dema berê de mîkrofon tune bûn, bi çêkirina çardaxekî vî teherî dengê Keşa berz dibe û diçe hemû beşdarên.

Di Dêra Evangelîyan de weaz gelek girîng tê dîtinê, lewra ev minbera weazê jî rind tê xemlandinê. Di cîhê minberê da resmên çar Evangelîyan tîn dîtinê, ev kesên ku di Încil'ê da behsa jîyana Îsa Mesîh kirine. Ev kesana bi nişanên xwe yê taybetmendî va tîn raydanê: Şûna Matêos, mirovekî, ya Markus pilingekî, ya Lûka ganêrekî û ya Yuhanna jî qertalekî . Di nava hîn Dêran da minber bi resmê Musa tê bi qaîm kirinê ku, li serê piyên wî da deh ferman cîh digrin.

Minber û cîhê xwendina weazê ne yekin, di oda textê da gelek caran di hembera minberê da tê bi cîh kirinê. Cîhê ku li wir weaz tê dayînê da nivîsê Încil'ê tîn xwendin.

Minber



Muzik di Dêra Evangelîyan de rolekî girîng dileyîze. Fena ku bi qisedanê metha Xwedê tê kirin, divê her wusa jî bi îlahiyên meqama muzîkê ev kar were kirin. Helbestvanan bi sed salane ji bona vê yekê helbest nivîsîne. Muzikvanên hunermend jî ev helbestana kirine beste, ango fena stranan jê ra melodî çêkirine. Bi vî awahî yê stranên Dêrê pêyda bûne. Ev stranên hanê ku bi sedan sal berê da di derheqa bawerî û duayên Mesîhiyan de hatine nivîsin di kitêba stranan ya Dêrê de qeyd kirine. Her kombûnê da cemeat ev strana distêre û bi vî awahî dua û îbadeta xwe tînin ziman.

Ev stran ku di nava Dêrê da tîn gotin bi aleta muzîkê Org (Orgel) ve jê re meqam tê belav kirinê. Ev aleta muzîkê gelek bi qîmete û hemû Dêran de li ber derîyê cîhekî bilind da cîh dibe. Bi salane gelek hunermendên muzisyen jî vê aleta muzîkê, Orgel'ê ve melodiyên xweşik çêkirine. Berê her tiştê di nava Dêra Evagelîyan de muzîka Johann Sebastian Bach ê gelek tê hezkirinê û qedrê wî tê zanînê.

Aleta muzîkê Org di gelek Dêran de bi destê kesekî di beşa zanîngeh ya muzîkê de xwendiyê tê leyistinê. Ev kes heman demê da koma muzîkê ya Dêrê re jî memostatî dike. Ev koma muzîk di her kombûna cemeata Dêrê de distêre û xeynî vê yekê cîhên cuda de jî Konzertan dide, şahiyên muzîkê amede dike.

Di Dêrê da muzik

Herausgegeben vom

Amt für Öffentlichkeitsdienst der Nordkirche
Zentrum für Mission und Ökumene - nordkirche weltweit

Kontakt:

info@afoe.nordkirche.de
AfÖ, Königstr 54, 22767 Hamburg

Text und Redaktion:

Hanna Lehming, Jörn Möller

Beratung:

Abut Can

Übersetzung:

Suphi Aydin

Gestaltung:

Evangelischer Presseverband Norddeutschland GmbH;
Christine Matthies

Bestellung:

www.bestellung-nordkirche.de

Fotos:

Titel: haloinli/fotolia; Landesbischof Ulrich: Sönke Dwenger/
Nordkirche; Kreuz, Altar: bildschoenes/fotolia; Bibel: Billion-
Photos.com/fotolia; Taufstein: Penzek/CC BY 4.0; Orgel:
Bramstercate/CC BY-SA 3.0; Kanzel: Schiwago/CC BY 3.0

www.nordkirche.de



Evangelisch-Lutherische
Kirche in Norddeutschland



„Hûn bi xêr hatin
Dêra me!“

Kurdisch



Evangelisch-Lutherische
Kirche in Norddeutschland

Xêr hatin!



Mêvanên delal,

hûn bi xêr hatin Dêra me, em gelek pê şane!

Dêr ev cîhe ku, Mesîhî têda ji bona dua û îbadeta Xwedê kom dibin. Xemil û çêbûna Dêrê, tiştên hûn li vir dibînin nişana bawerîya ola (dînê) Mesîhî ne.

Di nav bawerîya Mesîhiyan de gelek komên cure hene. Ev Dêr ya Evangelîyan ne ku, rêya roformîst Martîn

Luther ji xwe ra fena rêber qebûl kirîye. Di nava vê bajêrê de gelek dêrên din jî henin. Lê Mesîhiyên hemû komên cure di nava dunyê da girêdayî yê cemeata Hirîstîyanetiye ne.


Di nava Dêrê da meriv dikare gelek tiştan bibîne û pê bihese. Hûnê hîn tiştan nas bikin, lê gelek tişt jî bona we xerîb hebin.

Ev belavok wê we ra bibe alîkar û mereqên we ji bona derheqa Dêrê da bibersivîne. Ji bona cîrantîya baş pêwîste ku, meriv di derheqa ola hevdû de bibe xwediyê zanîne. Tenê bi vî awayî em dikarin di nava aşitiyê û aramiyê de bi hevra bijîn û welatê xwe baş birêve bibin.

Ez weka Metran yê Dêra Evangelîyan ya Lutherî bakûrê Elemanyê we careka din silav dikim. Hûn bi xêr hatin!

Gerhard Ulrich

Gerhard Ulrich



Di dema Romîyan de Mesîhî bindest bûn. Wan wê waxtê da bi veşartî, ne eşkera dihatin bahev ku, ji bona Xwedê dua û îbadeta xwe bikin. Lê di sala 380 da Împarator Theodosius ola Mesîhiyan weka dînê dewletê ya resmî elam kir. Li ser vê bûyerê gelek cemeatên Mesîhiyan Dêr ava kirin. Di nava Dêrên Mesîhiyan da bi gor gotinên pêşîyan, Dêra herî navdar, mûqaddes û menşûr, Dêra mezêlê (Dêra Qebrê) ye ku, li bajarê Qudusê, cîhê ku, Îsa Mesîh têda hatiye xaç kirinê û ji mirinê hişyar bûyî de ava bûye.

Di dema kevn da berê avahiya Dêran didan ber bi rojhilatê, dema mirov li Ewropa'yê, an jî li Afrîqa yê lê binêre, ber bi bajara Qudus'ê, dihatin dîtinê. Her wusa di welatên şerqê da, dema roj derdikeve ev yeka tîne ber bîra Mesîhiyan ku, bi belavbûna ronahiya rojê va Îsa Mesîh ji mirinê hişyar bûye. Di dema çurna navînê da Dêrên mezin bi gora şeklên xaçê, dihatin çêkirin. Bi vî awahî nişana muqaddes ya ola Mesîhiyan dihat xuyanê.

Di ava kirina dêrekî de cîhên herî berbiçav, texta qurbanê ye, keştiya navê û hêla deriyêne ku, hêla jora wê da birca çanê cîhê xwe digre. Di teniştî piraniya Dêran de odeyekî heye, tê da tiştên ku, dema dua û îbadetê da pêwîstin tîne danîne, fena cil û bergên Keşayan. Vê oda hanê re dibêjin; 'Sakristei'.

Mîmarî û xemla Dêrê



Kê biçê hundûrê dêrê, rasterast diçe ser taxta qurbanê. Ew li pêşiyê da ye û cîhê wê piçek bilinde.

Dema kevn da ev kesên ku bawerîya kitêba pîroz belav dikirin, di ser textekî da qurbanên xwe danîn. Bi vê yekê Nûh, Îbrahîm ji bona ku Xwedê wan qêda û belayan biparêze, ajelêkî dibirin ser wê textê da qurban dikirin. Ev yeka ji bona sipasdarî ya Xwedê bû. Gelek waxte êdî heywanên kedî di Dêran de nayên qurban kirinê. Di ola Mesîhiyande jî edeta wusa yê qurban kirin tune.

Ev texta qurbanê, heman demê da qurban kirina Îsa Mesîh bi xwe tîne ji ber bîra Mesîhiyan. Ji ber ku wî nedixwast xirabî bigihêje Xwedê û mirovatîyê, ew bi xwe bû qurban. Wî her waxt mirov dawet dikir û nan û şerabê xwe bi wan re parve dikir û tevî wan şa dibû. Ew mirovekî nefspiçûk û bi merhamet bû, lewra wî tevî gunehkaran, neçaran û nexweşan nan dixwar. Bi bawerîya wî de pêwîst bû ku, tu kes tîne nebihata hiştinê, lewra wî ev kesên ku ji bi karên xwe yê ne baş dîr ketibûn ji cemeatê dianî nava civatê.

Cemeat bi sipasdarî û hurmet ji bona Îsa Mesîh di der û dora texta qurbanîyan ya Dêrê de kom dibin. Ev yeka her wusa fena sofraya Xwedê jî tê bi nav kirin. Li wir pêşwazî bi mêvanan tê kirin û nanê êvarê ya pîroz bi her kesê ku, di Dêrê da vaffîz bûye û li wir amadeye tê parva kirinê.

Taxta Qurbanê




Ola Mesîhiyan berîya du hezar salan li bajarê Qudus'ê de çêbû. Ev bawerî li ser rêbaz û jîyana mirovekî bi navê Îsa yê Nasranî yê ava bû. Ev mirovekî pir xwînşîrîn û bi merhamet bû. Wî timî di navbera mirovan de aşiti çêdikir û wan nêzikê Xwedê dikir. Mesîhî wî weka kesekî ji aliyê Xwedê, ji bona xelaskirina dunyê hatiye şandin, qebûl dikin. Navê wî; 'Messias' bi Yewnanî 'Christus' tê gotin. Di ruhê Îsa de Mesîhî Xwedê û xwastekên wî yê zelal dibînin, lewra wî fena lawê Xwedê qebûl dikin.

Dagirkerên dema Romîyan wî mirovê nava gelê Cihûyan (Yahûdî) de fena kesekî rêber, îsyankar dibînin. Lewra wan Îsa Mesîh girtin û bi xaçê (çarmixê) va girêdan ku heta li wir bimire. Lê Xwedê dunya yê û bavê Mesîh wî ji mirinê rizgar kir û ji mirinê hişyar bû, wusa bawer dikin Hirîstîyan. Bi vî awahî Xwedê ew ji mirinê hişyar kir, hukma mirinê pûç kir, ji jîyanê re serfirazî anî.

Ji bona vê yekê jî berê her tiştê xaç di ola Mesîhiyan da nişanekekî pîroze. Ev çarmix tîne bîra mirovan ku, Xwedê jî tevî wan diêşê û lewra mirovan di nava mirinê da bin jî tenê nahêle. Lê li aliyeka din va jî xaç nişana ji mirinê hişyarbûna Mesîhe û bi vê bûyerê va ji bona mirovan bûye hêviyekî.

Di nava dêra evangelîyan de xaçe kî gelek mezin li jorê textê qurbanîya da tê aliqandinê, an jî li serêde tê danîne.

Xaç (Çarmix)



Kitêba ya Mesîhiyan kitêba pîroze. Ew ji du qîsman pêktê: Mîrasa kevn ya di derheqê çêbûna dunya yê û dîroka Xwedê û ya gelê wî Îsraîl da malûmatan dide. Mîrasa nû (Încil) di derheqa jîyan û zanîna Îsa Mesîh ku, çawa ji mirinê hişyar bûye û bi çî zehmetîyan cemeatên Mesîhiyan ava kirine da hatiye nivîsinê.

Ola Mesîhiyan bawerîya xwe bi kitêba pîrozê tîne. Kitêba pîroz bingeha îmana hemû Mesîhiyên dunya yê ye. Dema cemeat di Dêrê da kom dibe, ji kitêba pîrozê nivîs tîne xwendinê. Ev nivîs dema weaz dayîne da tîne xwendinê, bi zimanê roja me mehna (meala) wê tê eşkera kirinê.

Di nava bawerîya Mesîhiyan da komên cure hene. Dêrên Evangelîyan weka ya me di sedsala 16 da hatine avakirinê. Taybetmendîya dêra Evangelîyan eve ku, nivîsên mûqaddes

ji gor bawerîya wan gelek bi qedir û qîmetin, ji zargotina kevn ya Hirîstîyanan.

Di nava hemû Dêran de kitêbekî pîroz bi rûpel vekirî li ser textê xwendinê da hatiye dayîne. Ev kitêba pîroz bi hunermendîyekî hêja ve hatiye xemilandinê. Ew yeka nişana li wir amadebûna Xwedê û gotinên wî yê kitêba pîrozin.

Kitêba Pîroz